Ji helbesta Frensî



Wergêr ji Frensî: Enahîta Hemo

(1)ŞARL BODLÊR

Serê te, liva te, çeşma te,
hemû xweşik in rind in,
mîna dîmenek siruştî.
Herdû hinarkên rû yê te, dikenin
mîna sirek bayê xweş,
hênik di esmanekî sayî de.
Bi bûrîna te keder çû ji nişkê ve,
bi tendirustiya hiş çû
diçirisand mîna ronahiyê,
bi mil û piyên te.
Rengan diçirisandin,
Paşê belav dike xemlên xwe,
davêje di nêv hişê helbestvan,
wênên kulîlkan didin semaya Balletê…

(2)Jêrar du Nêrval

Berê, rojên xweş ji tozê.
Esmanekî ji rengê giyê û ronahiyê.
Dîwarên vêxistî û şevên dirêj.
Ne jî şînkahiyek, xuya dike bi dijwarî dîsa!
Rewqîneke, bi ser sor ve diçe.
Dixemilîne, darên reş û mezin.
Ev dema xweş bi min giran dike.
Min bê hêz dike.
Ew dîmenên rind nînin,
ji bilî rojên barîna baranê.
Pêdivî ye ku vemizt bibe di wêneyekê de.
Buhara şîn bi kulîlk e,
mîna "NYMPHE" geş venijî.
Zerdexene, dema tê hilat,
ji avjeniya xwe.
Ji avê…